Pirtûkin nû Pirtûkin nû

*

ŞIYÊ

Li vê dawiyê, mamoste Deham Ebdilfetah, hin ji helbestên helbestvanê bi nav û geng, Hamid Bedirxan, yên bi zimanê Kurdî, di pirtûkekê, di bin navnîşana **ŞIYÊ** de weşandin. Pirtûk li çapxana Amîral-Beyrûtê çap bûye û ji 120 rûpel û 41 helbestan -bilî diyarî û pêşgotinê- pêkhatiye. Di vê hejmarê de, emê hin perçeyên bijarte, ji helbesta **ŞIYÊ** ji xwendevanên **Newrozê** re biweşînin:

ŞIYÊ

Kulîlkek ji gulîstana welêt e !

Gul e, geş e ..
.Şiyê ye
Sînorê ronahî û tariyê ye
Av e,
Ava kaniyê ye...
Şiyê jîn e, mizgîn e...
Geh hişyar e
Tim dîn e
Bi birîn e...!
Hilm e .... bîn e
((Birca Belek)) a torevana ye,
li ser rêka nemirinê ye,
behişta dilan daniye.

****

Pirtûk: Ehmedê Xanî
Nivîskar: Heyder Omer
Çapa yekem: 2007
Qab: Xelîl Ebdulqadêr
Derhêner: Emîna Osman
Weşanxane: Hîro

((ev pirtûk bi alîkariya dezgeha SEMAKURD ya çand û hunerê hat weşandin- Dubey – Îmarat AlArabiye))

Ew pirtûk li dawiya sala 2007 an biderket. Ew pirtûkeke lêkolînî ye, mijara wê destana Mem û Zînê ye. Li sala 1997an hatiye nivîsandin, û piştî deh salan hat çapkirin.

Pirtûk ji 110 Pelên ji pîvana orte pêk tê. Ew bi çapeke xweşik li kaxezên zor baş derhatiye.

Pirtûk ji sê beşan pêk hatiye. Li dawiya wê ferhengokek biçûk jî heye. Dr. Ebdilmecîd Şêxo jî pîşgotineke zor li bejna wê hatî jêre daniye. Nivîskarê berêz H. Omer desteya Mem û Zînê bi zimanekî xweşik û bi hestên pir nazik dipelîne û dîsa cewherên nû û ciwan jê dertîne. Birastî pirtûk hêjayî xwendinê ye.

***

Çavrêbûn
Merwan Berekat
Hejmara weşanê: 1000
Çapa yekem: 2007
Qaba pêşîn: Burhan Ebdî

Çavrêbûn dîwaneke helbestê ye. Dîwan bi pîvana orte hatiye weşandin. Ew ji 108 rûpelan pêk hatiye. Helbestvan M.Berekat, hestên xwe yên zor nazik di riya 37 helbestan re tê rêtine. Ew bi wêneyên xweşik û hevokên li saz, di ezmanê helbestê de bilind firiye. Hemî cureyên helbestê di guldanka Çavrêbûnê de bêhn didin.